

Programa kontrola xwe bi xwe ji bo firotina bîraya gel (folköl)

5 kap. 5 § 4 st., 8 kap. 8 § 4 st. alkohollagen (qanûna alkoholê) (2010:1622)



Baş e mirov van tiştan li ser programa kontrola xwe bi xwe zanibe

Kesên ku plan dikin bîraya gel bifiroşin divê kontrola xwe bi xwe bikin da ku firotin li gorî biryarname û qanûna alkoholê (2010:1622) bimeşe. Ji bo bicihanîna biryarnamê li ser mijarê were garantî kirin divê xwediyê dikanê kontrola dikanê di programeke kontrola xwe bi xwe ya ku li gorî dikanê hatiye amade kirin de qeyd bike. Amadekirina programa kontrola xwe bi xwe berpirsiyariya xwediyê dikanê ye. Divê program tarîf bike ka rûtinên dikanê yê ji bo agahdarkirina personel a li ser biryarnamê qanûna alkoholê çawa tê kirin û ji bo firotina bîraya gel li gorî qaîdeyên mijarê bimeşe çî rûtin tene pêk anîn.

Programa kontrola xwe bi xwe ji bo xwediyê dikanê weke alaveke destekê ye û ji bo serdanên çavdêrkirinê yê şaredariyê jî bingehekî girîng dideyne. Eger tu firotinê li gorî biryarnamê qanûna alkoholê nemeşîni şaredarî dikare qedexeya firotinê yan jî îqazê bide te. Ev tişt dema tu programeke kontrola xwe bi xwe çê nekî jî wiha ye.

Eger izna te ya servîskirina alkoholê hebe hewce nake tu programeke kontrola xwe bi xwe amade bikî, ji ber ki jixwe wê demê tu qaîdeyên servîskirinê yê qanûna alkoholê bi cih tîni.

Cihê firotinê

Navê cihê firotinê	Adresa kolanê	
Hejmara posteyê û bajarê posteyê	E-poste	
Kesê têkiliyê	Telefon	Hejmara karkeran

Xwedî

Kesê ku dikana tiştên xwarinê ya ku bîraya gel difiroşe bi rê ve dibe divê 20 sal dagirtibin.

Navê firmayê (AB, HB, firmaya taybet û hwd.)	Organisationsnummer/Personnummer
--	----------------------------------

Li xwarê hin pêşniyazên li ser naveroka programa kontrola xwe bi xwe ya ji bo firotina bîraya gel hatine nivîsandin. Nivîsên alîkariyê yê li bin sernivîsan qaîdeyên li ser firotinê tarîf dikin û çargoşeyên îşaretkirinê pêşniyazên rûtinan e ku di kontrola xwe bi xwe de dikarin alîkariya xwediyê dikanê bikin. Herwiha agahiyên ku ne qaîdeyên firotinê ne, lê dîsa jî dikarin alîkariya te û personelê te bikin hatine nivîsandin û baş e ku hûn van nas bikin.

Sînorê temen û kontrola temen

Kesên ku bîraya gel teslîm dikin an jî difiroşin divê piştrast bin ku mişterî 18 sal dagirtine. Kesên ku berhevan teslîm dikin an jî difiroşin bi xwe ji kontrolkirina temen berpirsyar in û divê zanibin ku kesekî ji 18 salan biçûktir bîraya gel nakire. Eger kesê ku firotinê dike bîraya gel bide yan jî bifiroşe kesekî ji 18 salan biçûktir ew dikare cezayê pereyî yan jî heta 6 mehan cezayê girtîgehê bistîne. Eger personelê kasayê tê dernexa ka temenê mişterî çend e divê ew daxwaza nasnameyê bike. Ne hesan e ku mirov tenê ji şêkl temenê kesekî derxe. Loma ji bo garantiyê baş e ku mirov daxwaza nasnameyê ji her kesê ku ji 25 salan biçûktir xuya dike bike. Eger mişterî 18 sal danegirtibin divê bîraya gel neyêne firotin. Eger guman hebe ku kesekî mezin dê bîraya gel bikire û bide yekî ji 18 salan biçûktir dîsa divê berhem neyê firotin.

Ji bo kontrola temen li cihê kar çi rûtînên we hene?

- Eger em ne emîn bin ku mişterî 18 sal dagirtine em daxwaza nasnameyê dikin.
- Em ji agahiyên temen ên li ser nasnameyê temenê mişterî kontrol dikin.
- Dekal ango etiketêke temen heye da ku kontrola temen were rehet kirin.
- Em şîretê li personel dikin da ku ew li nasnameya her kesên ku ji ____ salan biçûktir xuya dikin binêrin.
- Eger mişterî nikaribe îsbat bike ku ew ji 18 salan mezintir e em firotinê nakin.
- Eger mişterî bi qasî ku em dixwazin nasnameyê nîşan nede em firotinê nakin.
- Eger personel guman bike ku bîraya gel ji kesekî ji 18 salan biçûktir re tê kirîn firotin nayê kirin.
- Eger mişterî esebî be personel bangî hevkarêkî xwe yan jî şefê xwe dike.
- Tişteke din:

Eger firotin li ser înternetê pêk were ji bo kontrola temen a li ser înternetê çi rûtînên we hene?

- Em bîraya gel li ser înternetê nafirosin.
- Dema firotin li ser înternetê pêk tê em bi rêya kartê bankayê yan tişteke wiha kontrola temen dikin.
- Tişteke din:

Hin rûtînên we hene da ku hûn kontrol bikin ka personel kontrola temen çawa dimeşîne? Wê demê çi?

Hûn çawa ji heqî rewşên problematîk diderkevin, bo mînak eger mişterî nexwaze nasnameya xwe nîşan bide?

- Em personel agahdar dikin ku heye problem di firotina bîraya gel de derkevin û ji bo çareserkirina van şîretan li wan dikin.
- Em personel li ser birêvebirina rewşên nankokiyê de perwerde dikin û agahiya li ser sînorê temen û kontrola temen didine wan.
- Tişteke din:

Agahiya li ser sînorê temen

Baş e eger mişterî bi awayekî zelal ji sînorê temen werine xebardar kirin. Ji bo agahîdana li ser sînorê temen pêk were û karê personel jî hesantir bibe mirov dikare lewhe û dekal ango etîketên bi agahiya sînorê temen li dikanê daleqîne.

Lewhe û etîket dikarin bo mînak li van deran werine bi cih kirin:

- Bi kasayê ve
- Bi refê berhemên bîraya gel ve
- Bi deriyê dikanê ve

Destek û perwerdekirina personel

Xwediyê dikana ku bîraya gel perakende difiroşe dê agahî û desteka ku ji personel re lazim e bide wan da ku ew karibin li gora qanûna alkolê û destûrnameyên li ser mijarê firotinê pêk bînin. Biryarnameyên ku li ser firotina vexwarinên bialkol hatine qebûl kirin hem ji bo firotina perakende ya bîraya gel hem jî ji bo servîskirina bîraya gel lê ne.

Herwiha divê haya hemû personelê kasayê û yê ku teslîmkirina bîraya gel dikin ji berpirsiyariya wan a şexsî ya li ser firotina bîraya gel hebe. Divê xwediyê dikanê vê agahiya li ser berpirsiyariya şexsî bide personelê xwe.

Personel bi çi awayî li ser şerta kontrola temen, berpirsiyariya wan a şexsî ya kirina sûc û biryarnameyên li ser firotina bîraya gel tê perwerde yan jî agahdar kirin?

<input type="checkbox"/> Dema personel nû tê girtin.
<input type="checkbox"/> Di civînên personel de.
<input type="checkbox"/> Bi perwerdehiya navxweyî.
<input type="checkbox"/> Bi perwerdehiya derveyî.
<input type="checkbox"/> Bi materyalê agahî û perwerdehiyê.
<input type="checkbox"/> Tişteke din:

Bi çi navberê personel li ser şertên kontrola temen û biryarnameyên din ên li ser firotina bîraya gel têne agahdar an jî perwerde kirin?

<input type="checkbox"/> Dema personel nû tê girtin.
<input type="checkbox"/> Herî kêr salê carekê
<input type="checkbox"/> Em ji bo qeydkirina perwerdehî û agahdarkirina personel tabloyeke zemên bi kar tînin (Li pêveka 2'an binêre.)
<input type="checkbox"/> Tişteke din:

Ji bo personelê ciwan desteka taybet

Ji bo kesê ku li ser kasayê dirûne û bîraya gel difiroşe tu şertên temen nînin. Lê dîsa jî divê personelê kasayê qanûn baş fêm kiribe û divê karibe li dijî firotina bîraya gel a bo kesên ji 18 salan biçûktir derkeve, divê ji bo vê xwediyê îmkanên baş be. Pirê caran ev ji bo personelê ji 18 salan biçûktir zehmet e, loma divê ew desteka taybet bigirin.

Ji bo personelê ciwan di firotina bîraya gel de ji heqî rewşên zehmet derkeve hûn çî desteka taybet didine wan?

- Li ser kar personelê ciwan ji yê bitecrûbe alîkariyê distîne.
- Personelê ciwan ji bo ji heqî rewşên zehmet derkevin perwerdehiyê distînin.
- Tedbîrên din:

Agahiya li ser kirîna kontrolê

Ji bo were dîtin ka cihê firotinê bi rûtînên baş kontrola temen pêk tîne şaredarî dikare kirîna kontrolê bike. Ev tê wê wateyê ku kesekî ku 18 sal dagirtine û ciwan xuya dike diceribîne ka ew dikare bêyî ku nasnameya xwe nîşan bide bîraya gel bikire. Armanca vê baştirkirina rûtînên kontrola temen e.

Ji bîr neke, ji personelê xwe re bêje ku heye kesek kirîna kontrolê li cihê firotinê pêk anîn!

Îstîsna

Divê kontrola te li ser firotina bîraya gel hebe û divê tu bikî ku personelê te jî li gorî biryarên li ser mijarê tevdiagerin. Girîng e ku tu kêmasiyên ku derdikevin ji holê rakî. Eger firotin li gorî qaîdeyên qanûna alkolê neyê meşandin şaredarî dikare ji bo şaşî werine rast kirin biryara qedexekirina firotinê yan jî îqazê bide xwediyê dikanê. Ji bo ji te re bibe destekek baş e eger tu tedbîrên ku tu ji bo jiholêrakirina kêmasiyan digirî qeyd bikî. Wê demê taqîbkirina jiholêrakirina kêmasiyan ji bo te jî hesantir dibe.

Eger kêmasiyek derkeve holê çî tedbîr tîne girtin, bo mînak eger li gorî biryarnamêyên qanûnê û programa kontrola xwe bi xwe neyê tevgerîn?

- Personel li biryarnamêyên li ser firotinê hûr dibin.
- Em ji bo materyalê agahiyê tîkiliyê bi şaredariyê re dideynin.
- Personelê bitecrûbe di firotina bîraya gel de xwediyê berpirsiyariya taybet e û alîkariya personelê bêtecrûbe dike.
- Firotina bîraya gel di nav rojê de di demeke bisinorkirî de tê kirin.
- Tedbîrên din:

Här finns plats för kommunen att lägga in egen information, till exempel information om personuppgiftslagen.

Îmza

Bajar û tarîx

Îmza (berpirsiyarê mafdar ê firmayê)

Zelalkirina nav

Beşek ji qanûna alkolê (2010:1622)

Kontrola xwe bi xwe

5 kap. 5 § 3 och 4 st. Kesên ku dê firotina perakende ya bîraya gel bikin divê ji bo vê iznê ji şaredariya ku firotinê lê were kirin bistînin. Heta izn neyê standin firotin nikarê were kirin.

Kesê ku firotina perakende ya bîraya gel dike divê vê bi awayekî taybet kontrol bike (kontrola xwe bi xwe) û divê piştrast be ku personel ji bo qaîdeyên firotinê xwediyê agahiya pêwîst in. Ji bo kontrola xwe bi xwe programeke taybet dê were amade kirin.

8 kap. 8 § 3 och 4 st. Kesê ku armanc dike bîraya gel servîs bike dê ji bo vê iznê ji şaredariya ku servîskirinê lê pêk were bistîne. Heta izn neyê standin servîskirin nikare dest pê bike. Ev gotin eger armanca 1 a §, 1 b hebe ne lê ne, an jî eger izna servîsê ji vêga ve hebe ev dîsa ne lê ne.

Kesê ku li gorî paragrafa sêyem ji iznstandinê mesûl e divê kontrola taybet jî (kontrola xwe bi xwe) ji bo servîskirinê bi cih bîne.

Daîreyên eleqedar

Folkhälsomyndigheten berpirsa çavdêrîkirin û taqîbîkirina qanûna alkolê ye. Li parêzgehê berpirsiyariya *Länsstyrelsen*, birêveberiya parezgehê, ya herêmî li ser çavdêrîkirina şaredariyan heye û şîretan li ser mijarê li şaredariyan dike. *Şaredarî* û *Daîreya Polîsan* bi awayekî herêmî hay ji çavdêrîkirin û bazara bîraya gel hene. Wezîfeya polîs a sereke di dema sûc de midaxele ye û şaredarî jî ji bo ku bicihanîna qaîdeyan di pêşerojê de jî were berdewam kirin hewl dide.

Reklamkirin

Konsumentverket çavdêrîkirina reklamkirinê pêk tîne û berpirsiyariya çavdêrîkirina cihê firotina bîraya gel digire ser xwe.

Izna reklama bîraya gel li ber dikanê û di hundirê dikana firotinê de heye. Reklama li ber dikanê dikare li ser lewheyek an jî afîşekê be û bi dikanê ve were monte kirin an jî ev dikare li ser lewheyekê be û bi çend metreyan dûrî deriyê dikanê were bi cih kirin. Pêşkêşkirin û reklama bîraya gel nikare zorlêker an jî dîlkêş be, û divê ev mirovan teşwîqî vexwarina bîraya gel neke. Divê şeklê reklamê jî zede diqatê nekişîne yan jî vexwarina bîraya gel teşwîq neke. Divê ev herwiha weke beşekî serdest ê jîngehê jî neye amade kirin, bo mînak divê gel bi awayekî mezin marûzî reklam û pêşkêşkirina vexwarina bialkol nemînin. Mirov nikare di reklamên vexwarinê bialkol de zarok û ciwanên ji 25 salan biçûktir bi kar bîne û reklam nikare berê xwe bide zarok û ciwanên ji 25 salan biçûktir.

Agahiya zêdetir

Ji bo agahiya zêdetir a li ser qanûna alkolê û destûrnameyên li ser vê tîkiliyê bi şaredariya xwe re deyne.

Gnesta Kommun, Miljöenheten, 646 80 Gnesta, 0158-275 000

miljoenheten@gnesta.se

Besöksadress: Västra Storgatan 15

Hûn dikarin etîket û dekalên li ser sînorê temen û materyalê perwerdehî û agahîdanê yê li ser qaîdeyên firotina bîraya gel ên qanûna alkolê li ser malpera Folkhälsomyndighetenê sipariş bikin, www.folkhalsomyndigheten.se.

